# Di Pêvajoya Çareseriya Demokratîk û Muzakereyê de

## KOMXEBATA JIN Û AZADIYÊ

## Atolye

### 1.1 Pênaseya Pirsgirêka Jin û Azadiyê

Divê ji bo çareserkirina Pirsgirêkê ya bi awayeke rast berê her tiştî pênaseyeke rast bê kirin. Pirsgirêka azadiya jinê bi sedemên dîrokî û civakî û di wextê me de jî wek pirsgirêkek qifleyî ye û her ku diçe zêdetir bi qetmerî dibe. Her wiha, ev pirsgirêk wekî çavkaniya pirsgirêkên civakî yên din e jî. Tundî, aborî, hawirnasî (ekolojî), ked, koç hwd. ji her hêlê ve aşkerakirina rastiya jinê rojeva bingehîn ya vê destgehê pêk tîne. Helbet ev pirsgirêkên hanê bi vê pêvajoya aşitiyê ve jî têkildar e. Ji bo me jinan aşitiya rasteqîn li hember vê pirrfirehiya serdestiya mêran bi avakirina rastiya jinê ve gengaz e. Em pêvajoya aşitiyê wekî fersendekê dibînin û li gorî vê pirsgirêkên xwe dinirxînin. Bi van nêrînan ve em dixwazin pirsgirêkê bi mijarên jêrî ve nîqaş bikin.

- **Wek dîrokî û civakî pirsgirêka jin û azadiyê**
- **Çawaniya bandora rojane**

a.Şer

b.Koç

c.Destdirêjî

d.Aborî

e.Tundî

f. Di perwedeyê de

g.Cudakarîbûnî û newekhevîtî

### 1.2Gihandina Azadiya Jinê ya li Zagonî û Makezagoniyê

Ristên ku jiyana civakî sererast dike bi tevahî hemû zagon û makezagon sererastkirinên xwe ne li gor lehiya jinan, heta niha li gor mêrê serdest hatiye çêkirin. Em wek jinan, dibêjin ku divê makezagon û zagon di avakirina wekhevî û aştiya civakî de wek peymanekê bên danandin. Di vê peymanê de sererastkirinên li gorî pêdivî û fikrên hemû hêlên civakê bi cih bibe girîng e. Helbet em wek jin divê daxwaza xwe ya peymanê xuya bikin û piştî zelalkirina gotinên xwe gotinan yek bikin. Bi vê peywendiyê ve vê beşê em dixwazin wek jêrî bidin nîqaşê. • •

- Nêrîna me ya li ser "Makezagonê ".
- Aşkerakirina rewşa heyî
- Pêşniyarên me yên çareseriyê

# Di Pêvajoya Çareseriya Demokratîk û Muzakereyê de

## KOMXEBATA JIN Û AZADIYÊ

### 1.3 Tevlîbûneke bi Rêxistinî û Wekheviyî bo Pergalê

1.5 pêrgala kapîtalîst ya mêrê serdest bi ber dewletê ve dixwaze civakê kes bi kes heta hucreya wan kerî bike û bi vê awayê zordestiyekê pêk bîne. Pêşberê vê ji bo avakirina aştiyekê rasteqîn û azadiya jinê bi nêrîna "kêmtirîn dewlet, zêdetirîn civak" ve em dikarin bi rêxistinbûyî tevlî pergalê bibin. Bi meclîs, komun û saziyên cûrbecûr ve dabînkirina azadiya jinê pêkan be û civakeke ku jin bikaribin gotinên xwe bi rêxistinbûyî bibêjin divê bê afirandin. Di çarçoveya serenivîsên mijarên jêrî de "ka çawa dê wekhev û rêxistinî tevlî pergalê bibin" dê bê nîqaşkirin.

- Em ji beşdariya wekhev çi fêm dikin, em dê çawa pêk bînin? (Bi awayê ku çespandin û rexneya rewşa heyî vehewîne)
- Em ji beşdariya rêxistinbûyî çi fêm dikin, em dê çawa pêk bînin? (Bi awayê ku çespandin û rexneya rewşa heyî vehewîne)

a. Dabînkirina derdor û zemîneke ku pêşiya her cure pêkanîna xwerêxistibûna jinê ku pêdiviya wê pê heye ve bike

b. Mekanîzmayên beşdariya wekhev û xwerêxistiniyê ( Komun, meclis, kooperatîf..)

c. Pergala me ya alternatîf çi ye? Avakirina civaka nû

i. Em dixwazin demokrasiya rasterast esas bigrin

ii. Di her qadê de rêxistiniya jinê ya xweser resenî

### 1.4 Pirsgirêka Azadî û Wekheviya Jinê ya di Malbatê de

Di hilberîna ji nû ve ya pergalê ya wek prototîpa dewletê malbatê heta roja me ya îro erkekî bingehîn girtiye ser xwe. Pergala serdest a mêr di kedxwariya ked û bedena jinê de malbatê xebitandiye. Heta malbat neyê dahûrandin û demokratîk nebe civakbûna aştiyê û azadbûna jinan ne pêkan e. Ji ber vê yekê demokratîkbûna malbatê ku hîma bingehîn a pergalê ye dê xizetê ji demokratîkbûna civakê re jî bike. Em di çarçoveya li jêr de nîqaşkirina arîşeyî ya azadiya jinê ya di malbatê de û bipêşxistina pêşniyarên çareseriyê dixwazin.

- Erka ku rewşa heyî û pergalê daye ser malbatê
- Malbat û polîtîkayên civakî

-Keda nav malê

-Tundiya nav malbatê

- Demokratîkkirina malbatê
- Jiyana hevjîniya azad